

## Bernameya Piştgiriya Fêrbûna Zêde ya COVID

### Agahdarî ji bo dêûbav û lênêran

#### Derbareya Bernameya Piştgiriya Fêrbûna Zêde ya COVID ê

Bernameya Piştgiriya Fêrbûna Zêde ya COVID (COVID Intensive Learning Support Program (CILSP) ji bo xwendekarên ku li seranserê dibistanên seretayî, navîn û pisporekên NSW-ê herî zêde pêdiviya wan bi wê heye, dersa koma piçûk pêşkêş dibe.

Bername di navbera Wezareta Perwerdehiyê ya NSW, Dibistanên Katolîk NSW û Komeleya Dibistanên Serbixwe yê NSW de xebatek hevpar e.

Ev bername ji bo alîkariya xwendekarên ku fêrbûna wan di serî de ji ber pandemiya COVID-19 bandor li serdemên dirêj ên fêrbûna ji malê kiriye, hate destnîşan kirin. Bername li ser xwendin û jimartinê disekine.

Her dibistan li gorî hewcedariyên xwendekarên xwe bernameya xwe pêşdixe û bernameyê bi mamosteyên perwerdekirî û mamosteyên din ên wekî mamosteyên zanîngehê û mamosteyên pêşdibistanê bi kar tîne. Van dersên komên piçûk dikarin berî an piştî dibistanê an di katên dewamkirina dibistanê de bêne girtin.

#### Bername çawa dixebite

Bi Bernameya Piştgiriya Fêrbûna Zêde ya COVID-ê, ji dibistanan re drav tê peyda kirin da ku mamosteyên din ên ku dersa komên piçûk ji xwendekaran re pêşkêş dikin bikar bînin.

Li gel midûrê dibistanê û bi karanîna cûrbecûr nirxandinan, mamosteyê polê diyar dibe ku dê kîjan zarok ji dersa komên piçûk sûd werbigirin.

Dûv re tevlêbûna her zarokê di bernameyê de bi dêûbav an nêrevanên wan re tê nîqaş kirin û plansaziyek hînkirinê tê çêkirin. Pêşkeftina zarokê bi rêkûpêk tê kontrol kirin û têkilî bi dêûbav û lênêran re tê domandin.

#### Taybetmendiya sereke yê bernameyê

- Di her dibistana Hikûmeta NSW de xwendekar ji hêla bernameyê ve hatine piştgirî kirin. Di sala 2021 de bi tevahî 265,000 xwendekar piştgirî kirin.
- Dersa koma piçûk ji hêla perwerdekarên zêde ve tê pêşkêş kirin - di nav wan de mamosteyên demkî û xanenişîn, û mamosteyên xwendekar. Mamosteyên din ji nêz ve bi mamosteyên polê re dixebitin da ku pê ewle bibin ku dersa li gorî hewcedariyên xwendekaran tê armanc kirin.
- Ders li ser xwendin û jimartinê disekine.
- Tîmek ji perwerdekar û rêvebirên pisporek di pêkanîna bernameyê de piştgirî û rêberiya dibistanan dibe...
- Dersa koma piçûk ji bo komên 2-5 xwendekarî piştgirîya fêrbûn û hînbûnê ya pêvek digire. Xwendekar bi domdarî ji bo demek diyarkirî bi mebesta xurtkirina hîndariya polê tene fêr kirin.

## Bernameya Piştigiriya Fêrbûna Zêde ya COVID u zarokê te

Mamosteyê zarokê we dê bi we re têkiliyê deyne, ger ew hîs bike ku bername dê feydeya zarokê we bike.

Ger hûn dixwazin di derheqê bernameyê de bêtir zanibin biçin ser Malpera Bernameya Piştigiriya Fêrbûna Zêde ya COVID ([COVID Intensive Learning Support Program webpage](#)). Heke hûn agahdariya bêtir hewce ne, vê bernameyê bi mamosteyê zarokê xwe re gotûbêj bikin.

## Xizmeta tercumanê telefonî

Heke hûn agahdariya bêtir hewce ne, ji kerema xwe bi mudîrê dibistanê telefon bikin. Heger hewcedarîya we bi tercumanek hebe ku di pîrsa we de alîkarîya we bike, ji kerema xwe telefonî Xizmeta tercumanê telefonî ya li ser 131 450 bikin û wergêrek bi zimanê xwe bixwazin. Hûn ê ji bo vê xizmetê dirav nadin.